

BÎLANÇOYA BINPÊKIRINÊN MAFÊN MIROVAN ÊN 6 MEHÊN PÊŞÎN ÊN SALA 2021 Î

Rojhilat û Başûrê Rojhilatê Herêma Anatoliyayê

-KURTE-

Binpêkirinên Mafê Jiyanê

Kuştina bi kêfî, binpêkirina rayeya bikaranîna çekê ya jî bi hinceta banga rawestîne lê hatiye kirin lê ranewestîye ji kesên hêzên ewlehiyê bi çekan berê wan daye 1 jê canê xwe ji dest daye, 6 kes jî birîndar bûne.

2 girtiyên ku bi îdiaya wan xwe kuştîye di girtîgehê de bi awayekî bi şik û guman 2 girtiyan canê xwe ji dest daye, girtiyek birîndar bûye.

8 leşker û polîs, bi îdia ku wan xwe kuştîye bi awayekî bi şik û guman canê xwe ji dest daye.

Di 6 mehên pêşîn ên sala 2021î de; rêvebirek partiya siyasî ji ber êrîşê birîndar bû. Rojnamevanek û 5 erkdarên tenduristiyê ji ber êrîşan birîndar bûn.

Di pevçûnên bi çek ên li herêmê qewimîne; 29 hêzên ewlehiyê canê xwe ji dest daye, 17 jê birîndar bûne. 129 mîlîtanên rêxistina bi çek canê xwe ji dest dane, qet nebe 2 mîlîtanên rêxistinê birîndar bûne. Li herêma başûrê Kurdistanê di operasyona bi desteka hewayî li Gareyê qewimî, 12 personelên hêzên ewlehiyê (Leşker, Polîs, Endamê Mitê) yê mîlîtanên PKK'ê ew girtibûn û welatîyek Îraqê canê xwe ji dest dan.

Li ser xetên sînor yek bi çekê hat kuştin. Yek jî qerisî.

Di teqînên mayinan de du zarok canê xwe ji dest dan, zarokek birîndar bû. Kesekî gihîştî (mêr) canê xwe ji dest da.

5 jê zarok, 28 jin û 3 mêr, tev di tevî hev de 36 kes mirî hatin dîtin bi awayekî bi şik û guman.

Binpêkirinên li cihên bi pevçûn pêk hatine jî wiha ne;

Li 56 bajar û 19 navçeyên li ser van bajaran li bi sedan herêman (nêzîkî 950 herêm), 7 caran herêma bi ewlehiyê ya taybet hat ragihandin. Li hinek herêman ragihandin, bi periyodîk hat dirêj kirin.

Li navenda du bajaran û li 130 gund/tax û gundikên 8 navçeyên van bajaran 8 caran derketina ji der ve hat qedexe kirin.

Malbatek bi zora cerdevanan neçar ma ku ji gund bar bike.

Binpêkirinên mafê jiyanê yê jinan ;

13 jinan întihar kir, 2 jinan hewl da ku xwe bikuji.

18 jin ji ber tundûtûjiya nav malê canê xwe ji dest da, 10 jin ji ber tundûtûjiya rû bi rû man birîndar bûn, dest dirêjê 3 jinan hat kirin.

5 jin ji ber êrîşan canê xwe ji dest dan, 12 jin jî ji ber êrîşa rû bi rû man canê xwe ji dest dan. Dest dirêjê 17 jinan hat kirin, zor li 9 jinan hat kirin ku fihûşê bikin. Jinek duçarê revandinê ma.

Binpêkirinên mafê jiyanê yê zarokan;

6 zarokan întihar kir.

2 zarok ji ber tundûtûjiya nava malê canê xwe ji dest da. 10 zarok birîndar bûn ji ber êrîşa rû bi rû man. 4 zarok bi zayendî hatin îstismar kirin. 2 zarok ji ber êrîşa rû bi rû man canê xwe ji dest dan, 3 zarok birîndar bûn. 11 zarok bi zayendî hatin îstismar kirin. Zarokek hat revandin û şantaj lê hat kirin û bi zayendî hat îstismar kirin.

Binpêkirinên Qedexehiya Êşkenceyê

Qet nebe 42 zarok di bin çavan de rû bi rûyê êşkence û miemeleya xerab hatin.

54 kes li cihên ji xeynî bin çavan (zikak- girtina bi ser malan de rû bi rûyê êşkence û miemeleya xerab hatin.

Kesek ji aliyê cerdevanan ve rû bi rûyê miemeleya xerab bû.

50 girtî, di girtîgehan de rû bi rûyê êşkence û miemeleya xerab bûn.

Hêzên ewlehiyê zor da 7 kesan ku bibin sîxur, li 5 kesan gef hat xwarin.

Binpêkirina Ewlehiyê û Azadiya Kesan

21 jê zarok 992 kes hatin binçav kirin.

161 kes hatin girtin.

Cezayê hepsa di malê de li kesekî hat birîn.

Girtin bi ser 739 mal û kargehan.

Binpêkirina Azadiya Fikr, Derbirîn û Birêxistin Bûyînê

Ji ber fikra xwe;

Di 14 dosyeyên lêpîrsînê de di der barê 77 kesan de dest bi lêpîrsînê hat kirin.

Di 8 dosyeyên dozan de li 39 kesan doz hatin kirin.

Di 28 dosyeyan de di der heqê 80 kesên di nav wan de siyasetmedar, rojnamevan û kedkar jî he ne de cezayên ji hev û din cuda yên girtîgeh û pere hatin dayîn.

Cezayê pere li 81 kesên beşdarê xwepêşandanên civakî û civînên ji der ve bûne cezayên cur bi cur ên pereyî hat birîn. 7 avahiyên partiya siyasî, 2 komal, avahiyeke şaredariyê rastî êrîş an jî girtina bi ser de hatin.

Hêzên ewlehiyê dest di 12 xwepêşandanên civakî ya jî civînên ji der ve werda. Destûr nedan ku 16 xwepêşandanên civakî û civîn ji der ve werin kirin. Civîn û xwepêşandan, li hin bajaran bê qewl, li hinan jî ji 15 rojan carekê ya jî her mer bi nû kirin hatin qedexê kirin. Di 6 mehên pêşîn ê sala 2021ê de 33 caran biryara qedexê kirinê hat ragihandin.

Binpêkirin Li Girtîgehan

67 girtî bêyî nîşandana tu hincet û boneyan hatin sirgûn/seq kirin.

13 girtî rû bi rûyê binpêkirina mafê tenduristiyê bûn.

Mafê hevdîtina malbatê ya kesekê/î hat asteng kirin.

Qet nebe 4 girtî ji mafê hevdîtinê bêpar hatin hiştin.

Di der heqê qet nebe 9 girtiyan de dest bi lêpîrsînê hat kirin.

105 girtî bi cezayê dîsîplînê hatin ceza kirin.

Girtiyek hat tecrîd kirin.

Binpêkirin Mafên Aboriyê û Civakî

Di qezayên kar ên ji ber şertên ne bi ewlehî yê xebatê bûn; 12 karkiran canê xwe ji dest da, karkir birîndar bûn.

Li erkdar qeyûman ji bo şaredariyên HDP'ê hat dewam kirin. Di 6 mehên pêşîn ên sala 2021'î de; 2 hevşaredar ji kar hatin kirin, li şaredariya navçeyekê qeyûm hat erkdar kirin. 4 Endamên Meclîsa Şaredariyê û Endamên Meclîsê yê Bajêr ên Giştî ji kar hatin kirin.

Zanyariyên bi kitekit ên di der barê daneyên qeyûmên hatine erkdar kirin li şaredariyên HDP'ê di salên 2019, 2020 û 6 mehên pêşîn ên sala 2021'î de di pêvek 1'î de ne.

KOMALA MAFÊ MIROVAN – ŞAXÊ AMEDÊ

PÊVEK - 1**BÎLANÇOYA QEYÛMAN PIŞTÎ HILBIJARTINÊN XWECIHÎ YÊN 31Ê ADARA 2019AN**

MAZBATAYÊN NEHATINE DAYÎN	TEV TEVÎ HEV
Hevşaredarên Mazbatayên Wan Nehatine Dayîn	6
Endamên Meclîsê Yê Mazbatayên Wan Nehatine Dayîn	51
Endamên Meclîsên Giştî Yê Bajaran ê Mazbatayên Wan Nehatine Dayîn	4

KIRINA JI KAR – ERK DAR KIRINA QEYÛMAN			TEV TEVÎ HEV
Şaredariyên Qeyûm Lê Hatine Erkdar Kirin	Bajarên Mezin	3	49
	Bajar	5	
	Navçe	33	
	Bajarok	8	
Hevşaredarên Hatine Girtine	Ên bi fermî hatine hilbijartin	24	31
	Hevşaredar	7	
Hevşaredarên Ji Kar Hatine Kirin			37
Endamên Meclîsan ên Ji Kar Hatine Kirin			86